

Xeteriya germahiya gerdûnî!

Navenda Nûçeyan

Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku germahiya gerdûnî ya ku wê heya sala 2040'î zêde bibe, wê bandorê li mirovên li bajaran dijîn bike.

Li gorî raporeke nû ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ger li hemû qadên jiyane pêngavên domdariyê neyên avêtin, girêdayî germabûna gerdûnî mirov wê bi gefên mezin re rû bi rû bimînin. Di raporê de hate destnîşankirin ku du milyar mirovên li bajaran dijîn wê heya sala 2040'î bi zêdebûna germahiyeke pileya 0,5'an re rû bi rû bin. Ji Dîrektoriya Jînewarê yê Neteweyên Yekbûyî Anaclaudia Rossbach di civîneke çapemeniyê de da zanîn ku wê germahiya li



jîngeha bi milyaran mirovan zêde bibe û wê lehî û karesatên xwezayî zêdetir bin. Her wiha di raporê de ev yek jî hatin gotin: "Piraniya bajarên mezin ên cihanê, bi milyon mirov û malhebûnên bi trîlyon dolarî li herêmên ku her sal bêparastintir dibe, tîr zêdekirin. Li gel mezinbûna van bajaran rîsk jî zêdetir dibin û

rê li ber felaketên mezin vedibe." Di raporê de hate destnîşankirin ku ji bo tedbîra vê yekê her sal hewceyî bi 4,5 û 5,4 trîlyon dolarî heye lê belê finansmana heyî bes 831 milyar dolar e. Her wiha raporê de hate diyarkirin ku ji ber zextên mezinbûna ku bi awayekî xirab tê kontrolkirin, li bajaran şînkahî gelekî kêr mezin dibe.

Ehmed Kaya; sembola têkoşîna hunera kurdî



Lîloz Hisên/Qamişlo

Stranbêjê û hunermendê kurd Ehmed Kaya yek ji mezinên ku di hunera Bakurê Kurdistanê û tirkîyê de cih girtiye, stranên wî di bîr û wijdanê me de maye, herwiha stranbêj Ehmed Kaya sembola stranên resen û modêla hunermendê ku bi doza gelê xwe mijûl bû.

Dema ku desthilatdar gelekî dagirbike, di destpêka her tiştî de ziman, çand û hunera wî gellî asîmîlasyon dike, çi di riya hedefgirtin û girtina hunermendan an rêgirtina ber saziyên ku bi çand û hunerê kar dikin. Ji ber ku çand û huner diroka gelan ya bi hezarê salan veşartî bû vedibêje. Ji nav hunermendên ku rastî girtinê hat ji ber ku bi zimanê xwe yê kurdî strand Ehmed Kaya, ku ji hêla dewleta Tirk ya faşîst ve demekê hate girtin û peyre penaberî dewleta Fransayê bû, da ku jiyan a xwe li wir berdewam bike.

Jiyana Ehmed Kaya

Ehmed Kaya di malbateke xizan de mezin bû, ji bavakê kurd û dayikekî tirk ji herêma Ediyeman li bakurê Kurdistanê di 28'ê meha Cotmeha sala 1957'an de ji dayîk bû. Malbata wî sala 1972'an de koçî Istanbulê kirin. Xwendina xwe berdewam nekir ji ber xizaniyê, gelek karên cuda kir. Lê pir jêhatî bû, di siyasatê de mijûl bû, bi Tawana belavkirina belavokên siyasî di deh saliya xwe de ket zindanê de.

Dihat zanîn ku Ehmed Kaya bi atmosferaya siyasî bandor bû, herwiha bûyerên ku pê re diqewimîn û bandorên wan ên civakî, têkoşîna çînî, xizanî û belengaiya ku çînen jêr ên gel bi taybet li gudan dikşandin, di wê demê de atmosferaya stranên netewî nas kir, di riya stranbêj "Rûhî Sû", ku starênên wî di nava xwendekarên zangêhê de belav dibû, her dema ku derfet çêdibû serbilindiya xwe bi kurdûna xwe nîşan dida û wê yekê jî gelek şovenîstan aciz dikir. Kaya di firotina kasêten muzîkê

Serhildana gelê kurd planên faşîzmê dirûxîne



Maskayên faşîzma Tirkîyê li Bakurê Kurdistanê tene rakirin û careke din rûyê rastî derdikeve holê. Li Bakurê Kurdistanê piştî serkeftina gelê kurd û destxistina şaredariyan bi îradeya xwe, faşîzma AKP-MHP'ê ji bo têkbirina vê îradeyê ji 4'ê Mijdarê ve dest datîne ser şaredariyên gel.**R-5**

Xebat û komîteyên Kongra Star...(3)



Kongra Star wekî rêxistineke jinan e, guh dide hûrbûyînen hemû qadên civakî û her tiştê ku eleqedarî jinan dibe. Da ku jin û civak bi rêxistin bibê û jiyanek demokrat, aştîyane û azad bidome, wê 14 komîte ava kiriye.**R-2**

Radyoya Xabûr dengê biratiya gelan e



Rêveberê Radyoya Xabûr Mêrxan Emadê diyar kir ku ew bi zimanên kurdî û erebî weşana xwe dikin û dengê xwe dighînin bajarê Heskê û gundewarên wê. Emadî da xuyakirin ku tevî şert û mercên dijwar ên ku herêm têre derbas dibûn jî, lê Radyoya Xabûr karê xwe berdewam kir û bû dengê şoreşê.**R-6**

PKD'ê nûnertiya xeta xiyaneetê dike

Endamê Meclisa PYD'ê ya bajarê Qamişlo Helim Iko diyar kir ku hevkarîya PKD'ê bi dewleta Tirk a faşîst re, ne ji îro de ye, PKD'ê bi awayekî êşkere dijminatiya çareserkirina pîrsgirêka gelê kurd dike û got, "Diroka mala Berazanî ji bo kurd û Kurdistanê diyar e."**R-4**



BI TÊKOŞÎNÊ WÊ AZADÎ PÊK WERE

25 sal in li girtîgeha Îmraliyê pergala îşkence û qirkirinê li ser Rêber Apo tê ferzkirin. Piştî çar salan ji negirtina agahiyan, di 23'ê Cotmeha 2024'an de, biraziyê wî Omer Ocalan hevdîtin pê re pêk anî. Lê piştî wê bi heftiyekê careke din cezayê displînê li ser hat ferzkirin. Li hemberî wê jî, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz Rêber Apo wekî vîn û nûnerê xwe pênase dikin û ji bo azadiya wî ya fîzîkî aştî têkoşînê bilindtir dikin.**R-3**



Jinê bi pênuşa xwe Festîvala Çand û Hunerê ya Rojava xemiland

Jinên ji herêmên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdariyêke cihêreng û aktîv beşdarî 10'emîn Festîvala Çand û Hunerê ya Rojava bûn, herwiha barê paraştina çanda civakê girtin ser milê xwe û roleke girîng di festîvalê de lîştin.**R-7**



Hevsengiya Rojhilata Navin tê guhertin

Ahmet Aktas R-4



Trump baş e ne baş e ti nanî nade me

Idris Henan R-5



Diaya kûçikan

Hafiz Ahmet Turhalli R-6

FERHENG A BIWÊJAN

Xwe xist bin bar:

- Bi heman wateyê.

Barê wî lê kir:

- Fêr kir.

Bizina kol hîn bû danê şor:

- Hîn bûye êdî xwe ji wir nake.

Gayê jigundkirî nasekine:

- Ji ber ku ji gund e, li malê nasekine.

Gavanê kera nake bîna tira:

- Hingî ew tişt pir dibe fêr bûye.

Halê kiriye, halê xwariye:

- Ji berê û pêş ve wisa kiriye; wisa fêr bûye.

Hesp li gorî sîwarê xwe diçe:

- Her tişt li gorî xwediyê xwe teşe digire; her kes li gorî perwerdeya dîtî reng digire.

Kerro mêvanê herro:

- Em naxwazin were; em ji hatina wî aciz bûne.

Kerro weke herro:

- Bi heman wateyê.

Lingên min ez birim wir:

- Ez fêrî wir bûme; keyfa min ji wan re tê; keyfa min ji wir re tê: Rê li ber xist: - Fêr kir; nîşan da; hîn kir.

Rê vekir:

- Serkêşî kir; destpêkê wî ew kar kir; piştî ku wî kir yêr din jî wisa kirin.

Riya ... lê vekir:

- Wî fêrî wî karî kir; wî li ber xist.

Xwe fêrî tamtîkan kiriye:

- Tiştên ku em nikarin peyda bikin ji me dixwaze.

LI SER KEŞÊ REWŞA WÎ YA NÛ JI YA BERÊ XIRABTÎR

Ji baranê revî ket ber zîpikan:

- Xwest biçe cihekî baştir, li cihê çûyîyê jî cihê berê pir nexweştir bû.

Ji baranê revî, li teyroke qelibî:

- Bi heman wateyê.

Ji ber baranê çû ber şîrikê:

- Bi heman wateyê.

Ji ber baranê çû ber teyrokê:

- Bi heman wateyê.

Ji ber baranê revî, li ber çortanê ket:

- Bi heman wateyê.

Ji ber bayê çû ber bagerê:

- Bi heman wateyê.

Ji ber bayê çû ber barowê:

- Bi heman wateyê.

- Bi heman wateyê.

Ji ber dilopê çû ber merzibê:

- Bi heman wateyê.

Ji ber şîrikê çû ber meziribê:

- Bi heman wateyê.

(Mezirîb bi zimanê Suryanî navê şîrikê ye)

Ji delava ketin çirava:

- Bi heman wateyê.

Bûka malê bi roj digere li kolana, bi şev dewla xwe radike diçe kizwana:

- Karê ne di dema wî de dike; xemsariyê dike.

Piştî baranê ga bi cil dike:

- Tişt a ku divê di serî de bike piştî re dike; di dema wî de kar nake; karê bêsûd dike.

Roja baranê kerê xwe dibe ser avê:

- Dema tiştê ne di wextê wê de bê kirin hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

